AŞIQÊ KULÎLKAN
Xwandinek di helbestên Eskerê Boyik da

Xwandin: Heso Hurmî *

Helbest mizgîniya subehiye, mijdeha pêşe rojê ye, neku dîroka nejadêye, lewra fermanberiya helbestê pêşbînî û dîtine, netinê tomarkirine.

Edeb bi giştî û helbest bi taybet ne rêkeke derbirînêye, belku ji bo vekolînê û lêgeryanê li rastiyê. Şîr (helbest) buye sîr, ne ku gulek bi kavlanê şîrave, şîr bu fakterekî sereke ji bo bewedanê ra, ne dengvedan wê ye.

Hinek ji şîr`erê kurmancî bi fermaneberiya hilwaistana gul û çîçekan bisînga siwaraveya radibin lê dîsan dibe û buye şîrek didestê wan ssiwar û fêris û lehingada bi minet barya wan helbestvanên nuxwaz, ku gelek guhurrîn peydakirine û nvkirin êxstine di warê helbesta kurdî da û yek ji wan rêzdarin Eskerê Boyike.

Divî xwandinê de em hinekê ji şî`rên fikrê diktor Esker wergirîn û pêkolê pitir wê dirol lîztina huner û fikrî û ciwankarîde, keyin yê ku hilbestvan pê rabuy di bizava helbesta kurdî ya nûda di rêka peywendiya Hunerî bi azadiya şoreşgêrane û pêgîriyê û hest û nest û fikra helbestvan divan warade.

Vegerendina şîrê bo jêderên bingehî û çafkanên elindî daku (xwendevan- rexnegir) bi duzîne, ronbike eve pîngaveke giringe diwarê pirosîsa rexneyê da nekêmtire ji ronahiya Hundirê helbestê bi xo da.

Şîr (helbest) li cem Eskerê Boyik ne ji valatiyekê hatiye û helbest ji esmanê bê stêr û bizav nayê afrandin, helbest erde, afrandina mirovane, encama şaristaniyetê, çande, perwerde ye, kawdanên welatên

cuda dcuda ye, jiyana penberyê, bindestiyê, jiyan jiyanê ye bêwiste em nasbikin daku hikmê me ney yek layane be, mîna Hîgil di bêje (pêwîste guzê bişkînin daku dizanin ci di hundirê wêdaye). Berhem/ helbest mijara waneyên serekene lê ne hokarekî temen e ji bo şirovekirinê, eskerê serhildêrm gelek neketiye direveke mîtavizîkîda weku hink şaîr (helbestvan) yên din yên nikarin berhingariya hêzên rîyal(ketwarî) bikin û ne ketiye tengaziya hizrî (fikrî) da sîmbulan bi kar biîne daku ezmîna hunerî beriv mijdaryê bihajot, belku dewlemendkirina ezmûna helbestê bi kardiîne,jîwarê ezmûna wî ya polîtîkî û jiyana wî li Ermenistanê /Corciya- Sitembolê- Elmaniya- dûr ji welatî, welêkiriye, hembêza kêmekê ji azadiyê bike weku perawêz.

Mirov _welat_ Kurdistan _welat _ax_ çiya_ gul_ xema hunerî ya here mezin û doza hebûna helbestvanê meye lewma di destpêka koma helbestên xuda dibêje:

welatê min heye dûr
Jê re dibên kurdistan
Birîna min heye kûr
Dişewite bê derman

Helbestvan her ji destpêkê dergehî li me vedike û nama xo radigehîne, ew nehatiye keyfa me bîne û gotinên xweş hîdî di guhên mede bêje.

(Edonîs) di gotineke xoda di bêje şaîr di sirûştê xoda şoreşvane û helbestvanê şoreşgêr yî gihorînkere û şaperên xo bi ser jîwarî (rîyalê) da berdida jibo yek mebestê:

Çerxekî nû bi de destpêkirin

Şaîr doze, xema serekî ya helbestvanê şoreşgêr netenî lêgeryan û destnîşankirin û nû kirin ji bo nûkirinê ye, belku ji bo peydakirina hevrikiya peyvane û peyv bibine şoreş, anku peyvê bike alavekî gihorînê di civakîda, Esker bangdike ji bo şoreşkirina helbestê, çunku Çaraserê xo tê dibîne demê dibêje:

Xwezî neha ez li nav wan çiya bûma
Kêleka wan egîd, efat, mêra buma
Pêşmergekî şewat bûma biruh û can
Min ji xûna xwe birêta seva wetan

Û gelek mînakên din hene vê çendê di selmînin, Esiq derbirîn ji karwanê vegeriyanê bo kaniyên lotik û kemaliya mirovatiyê, Eflaton dibêje: Eşiq birîneke direwşa beşeryerêde û lêgeranek herdeme pêxemetî çareseriya jêkvebûnê û gerandina hêza xwe ya resen û yekbûn û êkgirtina windabuyî.

Eşiq li cem (Eskerê Boyik) dibistana wekhevî û piştgirtin û guhdarkirina yê berambere, dibistana xo dîtina xo di xodîka demê da, eşiq bahozeke hemûperdên kedxwar û sitemkariyê didrîne û di be mitirsek li ser wê genî bûna heyî likayê û bihna wê

genî bûna heyî naçe pozê kesî, eşiq mirneke, lê corê wê yê taybete.

Rabim vexwim kasa eşqê
Bîrkim van derd û kula
Zînkim, sîyarbim hespê sîn boz
Bikevme nav gul_ dila
Jîya demeke sîrine
Îro heye sibê na
Xwezya min wî yê dil dike
Yê dil dijî û navêje simila

Baweriya wî bi çînatî û tuwîjatî ya çêkirî nayê û dixwaze yî zal be li ser vê hizrê

Keça şivên bûye rewşek nûr
Ser dêmê çîyê ken û keser
Dimilmile sivik, nazik
Dimilmile kesk û sor û zer
Rabim rêça wê herim
Şxwedê zane rîya me yeke
Ber êvarê gêrîla ra
Wê xarina karya çêke

Mirin berî bibe hizir ezmûne, berî bibe pirsgirîkeke folosofî helwîstê her mirovekî beramber mirnê yê arnizî heye, mirin corin, mirina bê buha, dad_ gunehbar, mirin heye meşxela jîyanê vedimrîne û mirin heye bûnê dide destpêkirin, ew kevrê bingehîye di nûkirina jiyanê û siruştê û gerdûnê da, helbestvanê me yê hêja mirinê weku rûdaneke buharî di bîne û ew dawya werzên din radigehîne

Mirina kalkê min
Kalkê min nexweş bû
Nexeşê giran
Mirin bikirçî bû
Derdî bê derman
Li ser sedsaliya xwe
Ça mêr mêranî
Pêşya mirina bêwa
Zor şer dikir wî
Û wextê xuber dît
Derd bê dermane
Go: minderxin derva
Ruhêm li çîyane

Egere fakterên hevnişk di helbestên kekê (Esker) da bi kine lêsta wê kulilik_ çîya qîz çîya_ kulilik û dîsan ciya çihê xo bi giranî zeft ken.

Ez hez dikim
Çîyanên xemilî bi kulikên al
Geliyên bi xezal
Bin kolozê ewr qotêd wanê kal
Û golêd zelal
Li cihekî din dibêje:
Her çiya çiya ne
Ser serê wan sêvane
Sêvan mîna çavane

Brû kulyê ewrane

Radimûsin ezmane

Dîsan dibêje:

Çîyêdminê bedew_ kubar

Min ça bira we kiriye

Histeta we vê êvarê

Xwe ji çavê min birye

Û dibêje:

Van kulîlka van nazika

Van bedewê çîyayê me

Îro ezê baqim xwera

Û bişînim mala we.

Her berxwedane hebe pêwîste rewşenbîrîyet (çand) piştgirtinê lê bike daku berdewam yê bi xo bide û rolê xo heye dawyê bileyizîne û helbestvanê me ji bo xo domandinê dibêje:

Wextê ku çîya pişt kutane

Pişt hev

Hildana wan zef zore

Wextê merya pişt kutane

Pişta hev

Kesek wana nikare..

Erdê gelek têgeh hene, yên simbolî, bivavî polîtîkî, îkonumî, erd cihekî mezin di şîrê meda digire, dixwaze xo bigehîne vî erdî di rêya kulîlka dara _befrê xwîna şehîda dirêya her tişt bûna wî ji erdî be û li erdê be, doza wî erde erd doza wî ye, Esker li hebûna xo digere lê biyava wî ye tenge, hewil dide cih û demên jêk cuda bike yek wêne di çarçovekî zêrînda bi sîngê azadiyêve hilawsitîne.

Azadî her azadî dirya xwedê azadî

Navê mere azadî û ziman ra azadî

Mîna xelkê em kurd jî bijîn xwera azadî

Li jêr ala me ya ku di mejyê wîda pileyeke na azayî hey di bêje:

Ala me hê stûxare

Aza me biderda bare

Aemanca me hê azaye

Axa welatê me bêxa ye

Diyalokê bizimanekî ji hev famdikin dide meşandin, ev ziman zimanê meye hebûna meye

Zimanê me dengê çîya ne

Xulexula çew kanyane

Ew him ave, ew him nave

Ew heyîtiye me kurd ne

Bi gelek waranda pirosîsa tevlî hevkirina (jîn û welatî) daye meşandin lewra delîya jêre çênebuye wêneyê jinê bide nîgarkirin, sîmbola jîyanê û berxwedanêye diyarokê sitrranê di helbestand xuya dibe.

Derenge werê werê

Delê lê lêlê narê

Qîzik cûne pircare

Min sûretê sor xarê

Dûbarekirin di dîwanêda gelek berz û mişeye û bi kar anîna sîmbolên efsaneyî

ye kême cîhana hunerî bigiştî cîhana sîmbolayê efsaneye û yadgar û bîr anîna hinek nîvîskarê çoyine ber rehmetê mina (Haciyê Cindî _Seîdê Îbo_ Ferikê Ûsiv.... het. buyine stunên ava kirina hinek helbestan.

û bi dengê bilindî bersiva wan kesan dida û banga kurdatiya êzîdiyan ya resen dike û dakokiye liser dike deme dibêje:

Kurdê esil ezim heme

Welatê min kurdistane

Pir hindikin li cihanê

Yê mîna min paqij mane

Li cihekî din dibêje:

Ez him kurdim

Him Êzdî

Halê min pir dijware

Dest hişê xwe

Gelê min

Hela sêfîl û jare.

Aşopiya hizir û ramanê Eskerê Boyik wê bibe binwaşe jibo bihêzkirina ramanên xwendevanên van herdû komê helbestên vî hêjayî:

1_ kulîlkê çîya_ çapa yekê 1979 Istanbul

çapa duyê 1990 Kolin, weşanxana rîya azadî_ 152 rupel (Kurdî_ Turkî).

2_ kulîlkên birîndar (1998 swîd_ weşanên oêja nû 288 rupel_ kurdî)

Nasnama helbestvanî

-Dr. Eskerê Boyik li Ermenîstanê li sala 1941ê hatiye dunyayê.
-Pileya diktora xo ji zanîngeha yêrîvanê li sala 1974 wergirtîye.
-Endamê yekitiye nivîskara yekitiya Sovyatê ye li sala 1974ê were
-Bi zimanê kurdî, Ermenî dinvîse.
-Di warê dîroka, rojnamegeryê, wêje, şano û helbestê da xebata xwe di domîne.

* Heso Hurmî sernivîserê kovara çira holinda